

Gotina Berpirsiyarê Rêxstina P.Y.D.K(Yekîtî) Li Ewropa di behiya nemir Îsmayîl Omer de

**Xwîşk û birayên hêja..
nûnerên partî û rêxistinên dost û bira...
Hevalên hêja...**

Berî hertiştî ez bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê beşdariya we îro li vir silav dikim û spasiya we hemûyan dikim ku hûn bi vê yekê dixwazin rêz û giramiya xwe ji giyanê nemir mamoste Îsmayîl Omer re diyar û pêşkeş bikin. Helbet ev tenê wê wateyê dide, ku miletê me, li kû dibe bila bibe, tu caran xebatkarên xwe ji bîr nake, wan bi tenê nahêle û herdem xwedî li wan der dikeve. Miletekî weha jî, bê guman, dê dûr an nêzîk, bigihîne armanc û daxwazên xwe, dê bigihîne azadî û serbestiya xwe.

Xwîşk û birayên hêja...

Bi dilekî xemgîn, baskine şikestî û bi çavine tijî rondik me nûçeya koçbarkirina dawiyê ya xebatkarê hêja mamoste Îsmayîl Omer, serokê partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bihîst. Mamoste Îsmayîl ne tenê serokê partiyekê bû, ne tenê kurdekî welat- û netewparêz bû. Ew beguman:

Mamosteykî bi hemû wateya gotinê bû, dibistanek bû. Em her fêr- dikirin bê çawa peydakirina dostan ji doza me re girîng e; bê çendî diyalog û hevpejirandin girîng e. Em fêr kirin bê çawa mirov di xebata xwe de deyan û dilsoz be. Em fêr kirin bê çawa mirov ewqas nêzîk dost, heval û gelê xwe be û herdem di nav wan de be. Em fêr dikirin bê çawa mirov dikare bê westan ji bona yekîtiya Tevgera Kurd û avakirina nûnertiyeke netewî bixebite; - Mirovhezekî ji dil de bû. Ji rabûn û rûniştinên wî, ji axaftinên wî û ji lebat û kirinên wî her ew rastiya dixuya ku mamoste perestvanekî maf û azadiyên

mirovî bû;

Kurdayetîparêzekî deyan û serhişk bû. Wî 47 salan bê westan ji bo- doza gelê xwe yê kurd bi hemû derfet û şiyana xwe xebat kir. Hertim jî ew hîn tî û birçiyê kar û xebatê bû;

Diyalogperest bû. Nemir herdem bi her kesî- re, ne tenê bi dost û hevalan re dikarî bi nermî (lê bêyî ku ji bîrdozên xwe yên kurdayetiyê paşde vegere) diyalogê bike. Wî her hewil dida ku dostan ne ji xwe û partiya xwe re, lê ji doza gelê xwe re, ji azadî û wekhevîyê re peyda bike.

Ji ber van xeysetên nemir ne tenê dilê me, belê dilê her dost û çî-hevalê ku mamoste Îsmayîl Omer (rehma Xwadê lê) nas dikir yan pê bihîsti bû bi nûçeya koçbarkirina wî ya dawiyê xemgîn bû.-kurd, çî ereb yan asûr û siryan

Xwîşk û birayên hêja:

beşdariya me îro li vir, helbet, nîşana wê yekê ye, ku em dixwazin li hemû wan nirx û taybetiyan, yên ku mamosteyê me yê nemir ji bo wan dixebitî, bi bîr bînin û ji bo parastin û pêşvebirina wan jî amadebûna xwe nîşan bidin. Ew nirx jî bi kurtî ev in:

1. Parastina nirxên rasteqîn yên kurdayetiyê;
2. Dijberiya nijadperestî, şovenîsm, tundrewatî û çavtengiyê;
3. Xebata bo pêşxistin, serastkirin û duristkirina hizr, boçûn û bîrbaweriya mirov û civaka me;
4. Xwedîderketina li vîn û daxwazên gelê kurd bona jiyaneke azad di welatekî demokrat de;
5. Parastina taybetmendî û serbixweyiya doza kurd li Sûriyê.

Beşdarên xweşewîst,

helbet koçbarkirina xebatkarekî weha, ku piraniya jiyana xwe bona gelê xwe yê kurd û doza wî ya rewa û dadmend terxan kiri bû, ziyaneke gelek mezin, giran û êşdar e. Ne tenê ji partiya me re, belê ji

D . R (10)